



Agahdarî! Jehrîbûna bi kumikan !

Bêhtir ji 30 nexweşiyên metirsîdar di rêka kumikên amanît de, li nav penaberan belav bûne

Bijîjkên elman hoşyariyê didin, ku kumik neyê danehev bo xwarinê. Di va çend rojên dawiyê de, bêhtir ji 30 penaberî, li Hannoverê, di rewşeke metirsîdar de ne, hatin avêtin bo nexweşxanê, ji ber jehrawiyeke zor. Sedem jî ew e, ku gelek reng ên kumikên jehrawî, li Elmaniya hene, mîna rengê kumikên li welat ên din têne xwarinê. Di encamê de, penaber van kumikên amanît yên gelek metirsîdar kom dikin. Metirsiya mezin di wir de ye, ji ber tu tameke taybet nade û nîşanên wê piştî çend saetan ji xwarinê xwe didin der..

Şîreta me ya lezgîn:

- Daneheva kumikan bo xwarinê qet nekin, bitaybetî, dema hun baş di nasîna wan de neşareza bin.
- Ew kumika ku li welatê te, xwedî tameke xweş bû dikare li vir kujer be.
- Eger guman hebe ku tu bi jehriyê ji ber xwarina kumikan ketibî, di cihê cih de, berê xwe bide nexweşxaneyê herî nêzîk. Jibîr neke, tiştê ji ber xwarinê mayî, an jî tiştê we di devê xwe re avêtibe (verîşandin) bi xwe re bibî. Ev naskirina çeşitê jehrîbûnê dermankirinê asan dike.
- Van agahiyan ji rûniştîyên penahxana (Kamp) xwe re vebêje. Vegotin jiyana gelekên ji mirinê azad dike!